



**TU DIZANÎ  
ÎSA MESÎH KÎ YE?**

Abdul-Mesîh

Was denkst du über Christus?

Kurmandschi

What do you think about Christ?

Kurdish-Kurmanji

İsa için ne düşünüyorsunuz?

Sådd och Skörd Förlag. © 1988

Box 49062, S-400 64 Göteborg, Sweden

Mizgînî 1997 by permission

Postfach 1125

35441 Biebertal

Elmanya/Germany

Kitabı Mukaddes Şirketi

İstiklâl Câd. No: 481

Beyoğlu İstanbul, Turkey

Tel: 0212 244 20 60

## **Baweriya we di derheqê Îsa Mesîh de çi ye?**

Hûn di derheqê Mesîh de çi bawer dikin? Hertişt bi vê bersivê ve girêdayî ye: kêfxweşiya te di vê Dinyayê de, bûrandina te di Dinya din de çi ye û tê li wê derê çawa bijî? Îsa Mesîh wê zû dîsa vegere û wê ji te pirs bike, wek ku wî berî niha ji Fêrisiyan pirsî: "Hûn di derheqê min de çi bawer dikin?"

Ez îro wek bawermendekî Îsa Mesîh têm ba we. Ez dixwazim bibim dostê we. Ez bi rastî dixwazim, ku hûn bizanin Mesîh kî ye û gelekî mihim e, ku tu kes we di vê pirsa giring de şas neke. Divê hûn bawer nekin, ku ew bi tenê pêxember e, an jî mirovekî qenc e wek gelekên din. Na, ew yek e û bê hember e. Tu kes wek wî ne li vê Dinyayê, ne jî li wê Dinyayê nîn e.

## **Hûn di derheqê bûyina wî ya xweş û newaze (şanyazî) de çi bawer dikin?**

Tu kes tucaran wek wî newelidiye. Ew kurê Meryem e. Wek ku hûn dibêjin Îsmaîl kurê Birahîm e, Yûhenna kurê Zekerya ye û Mihemed kurê Abdulla ye. Zilamên din hemû ji bavê xwe nav distînin. Çima Îsa ji diya xwe nav standiye? Belê, ji ber ku bavê wî yê dinyayî tune bû, ew ji Meryema keçik welidî.

Ew bi qudreta Xwedê welidî, bê têkiliya zilamekî (yanî bê zewacî).

Berî ku ew çêbibe bi heftsed salî pêxember Îşaya gotibû, ku ewê çêbibe (Kitêba Îşaya 7:14) û tam wek ku berê gotibû, tam wilo çêbû. Hûn dikarin vê yekê di Încilê de, di Kitêba Metta 1:18-25'an de bixwînin. Xwedê bavê me Adem ji axê çêkiriye, em û pêxember jî tevde ji Adem çêbûne.

Em ji axê hatine û dinyayî ne. Xudan Îsa ji ezmên hate xwar. Ew paqij û bê kêmâyî wek berf û baranê ye. Yê din hemû ji Dinyayê ne û ne paqij in û bi guneh in. Em dixwînin, ku "Mesîh hatiye Dinyayê ji bona ku gunehkaran xilas bike" (Încil, Nameya ji Tîmotêyo re ya pêşî 1:15). Ew hate cihekî xerîb wek ku hûn hatine dewleta xerîb. Îsa bi Xwedê re bû berî ku ew bê xwar. Wî birtyara (qirara) xwe da, ku bê vê Dinyayê û hate vê Dinyayê, ku me xilas bike. "Di destpêkê de Peyv hebû", yanî Xebera Xwedê, Îsa Mesîh hebû (Încil, Kitêba Yûhenna 1:1-3 û 14 bixwînin). Wî bedena însanan stand û bû mirov. Ew ji ezmên hate erdê.

Carekê du zilam ketibûn çaleke kûr de. Yekî ji yê din re got: "Min xilas bike ji vê pîsîtiyê!" Yê din lê vegerand û got: "Ya bêaqil, ezê çawa bikarim? Ez jî wek te di eynî pîsîtiyê de me." Herdû jî di çalê de bûn û yekî nikarîbû alîkariya yê din bikira. Wî çaxî werîsek ji jor hat û dengek jî pê re hat û got: "Bi werîs bigirin!" Tenê zilamê ku neketibû çalê dikarîbû alîkariya wan bike. Ew alîkariya ji jor ve hate şandin bi alîkariya yekî din.

Pêxemberê ji hemûyan baştir ji nikarîbû me ji çala gunehan xilas bike, lê belê Îsa bedeneke bê guneh stand. Xwedê milyaket şandin, ji bo ku mizgîniya welidandina wî bidin. Ew bi büyîna xwe bi tenê ye. Em nikarin wî bi însanevê din re qiyas bikin.

## Tu di derheqê tebietê (qerektêrê) wî de çî bawer dikî?

Îsa Mesîh kamil bû. Wî carek bi tenê jî guneh nekir. Wî tucaran tu şaşîtî nekir. Ew tucaran hewce nebû, ku ji bona efûkirinê rica bike. Pêxember Dawid rica kir. Pêxember Birahîm rica kir. Bi rastî pêxemberekî din jî got, ku wî rojê heftê caran ji bona efûbûnê ji Xwedê rica dikir. Tu dikarî di Kitêba Pîroz (Kitêba Miqedes) de û di Quranê de heta tu bêjî bes bigerî û tu carekî jî nabînî, ku Îsa ji bona efûbûnê rica kiriye. Efûbûn jê re ne lazim bû, çimkî ew bê guneh bû.

Şagirteki wî yê nas di derheqê wî de nivîsandiye û gotiye: "Ew ji gunehan bêrî bû û bê guneh bû. Wî tu guneh nekirine." Wî mirovî ew qenc nasdikir. Xwedê pêxember efû dikirin, gava ku wan gunehên xwe digotin, lê belê Îsa nehewce bû ku bê efûkirin. Ew bê guneh bû. Heta ku wî dikarî bêje dijminên xwe: "Kî ji we dikare nîşan bide, ku guneh li ba min heye?" (Încîl, Kitêba Yûhenna 8:46). Tu kesî ji wan nikarîbû ku gunehhekî jî di jiyana wî de bibîne.

Kî ji me dikare bi vî awayî ji dijminêن xwe re meydanê bixwîne? Îsa birin ba hakim Pîlato û wan bi derewan şehdebûnî li ser wî dan, lê belê Pîlato nikarîbû şasîtiyekê bibîne. Wî destêن xwe şuştin û got: "Ez ji xwîna vî mirovê rast bê sûc im". Tucaran mirovêن bê guneh peyda nebûne. Lê belê ew bi tenê xilaskarekî bê guneh e. Ew bi tenê ye û bê hember e.

## Tu di derheqê xeberêن wî de çi bawer dikî?

Carekê dijminêن wî esker şandin, ku wî bigirin. Wan guh dan peyvîna wî û piştre bê girtina wî vegeriyan û ecêbmayî man û gotin: "Tu kes tucaran mîna wî mirovî nepeyiviye (xeber nedaye)!" (Încîl: Kitêba Yûhenna 7:46). Lê belê bifikire, ku wî çi got: "Ez ronahiya Dinyayê me. Her kî ku li pey min were, wê tucaran di tariyê de rêve neçe, lê wê bibe xwedî ronahiya jiyanê" (Kitêba Yûhenna 8:12).

Mirovekî pîr carekê ji min re şirovekir, ku mena wan peyvên Îsa çi ye. Wî got: "Tu zanî, ya dostê qenc, ku pêxember wek heyvê ne. Çawa heyv bi şev ronahî dide, pêxember jî bi ronahiya Xwedê hatine vê Dinya tarî. Heyva nîvçê tam wek pêxemberekî ye. Ew bêhtir û bêhtir ronahî dide, heta ku ew bibe tam heyv û piştre kêm dibe û dimire. Lê belê netirse. Heyvek din wê bê cihê wê. Pêxember wilo yek bi yek hatin. Yekî xebera xwe

got û mir, çû û cihê xwe ji yekî din re hişt. Her mileteki parça ronahî ji Xwedê standiye.

Dînên mirovan wek mûm in, an jî wek heyvê ne. Lê belê gava roj ronahî bide, kî wê li wan ronahiyêن biçûk bînêre û wan bi kar bîne?" Îsa got: "Ez ronahiya Dinyayê me." Ew ronahiya heqiyê ye. Te qet dîtiye, ku roj kêm bûye an jî winda bûye? Na, ew qet namire. Ew ji bona hemû kesî li hemû dewletan e. Îsa wek rojê ye. Ew tucaran kêm nabe. Ew ji bona her dewlet û her mirovan e. Wî gotiye jî: "Rê, rastî û jiyan ez im." Pêxember hemû hatin, ji bona riya ku diçe ba Xwedê bidine naskirin. Wan got: "Ev riya Xwedê ye. Bi vê riyê ve herin!" Riyên rast nişanî wan dan û gotin: "Li pey vê hînkirin û zanînê herin û li gora peyva Xwedê bikin". Lê belê Îsa got: "Ez rê me, li pey min werin!"

Kurikekî biçûk li bajarekî mezin şas bû. Ew ji welitekî din bû û nikarîbû xwe qenc bide fêmkirin. Wî hêvî ji polîsekî kir, ku riya malê şanî wî bide. Polîs jê re got: "Di vê enîşkê re here, bizivire enîşka didiwan ya aliyê rastê, piştre here enîşka sisiyan ya ku diçe aliyê rastê, ji pirê bibihûre, li zîrvoneka çara bizivire û di nîvê riyê de..." Kurik dest pê kir girî. Polîs riya rast şanî dabû, lê belê kurik westiyabû û ditirsiya, ku li gor işaretkirina wî here. Wê kîlîkê mirovek ji gundê kurik hat. Mirov rahişte destê kurik û ew bi hev re çûn. Gava kurik westiyabû û nikarîbû bimeşe, mirov rahişte wî û ew hilgirt heta mal. Polîs rê şanî kur dabû, lê belê

mirovê din wek rê bû. Îsa got: "Ez rê me, riya mala Xwedê."

Tu çi li ser meseleyên wî yên xweş dibêjî ? Tu çi li ser bangkirina (gazîkirina) wî ya xweş dibêjî? Wî got: "Werin ba min, hûn hemû yên bargiran û westiyayî, ezê rihetiyê bidim we" (Încîl, Kitêba Metta 11:28). Çiqas xweş e! Tu di derheqê peyvên wî de çi dibêjî? Kesek tucaran wek wî nepeyvî. Ew yek e. Ew bê hember e. Tu kes wek wî nîn e, ne li erdê ne jî li ezmên.

## **Tu di derheqê navê wî û wesfê wî de çi bawer dikî?**

Her pêxember navekî wî yê şexsî heye. Ji Birahîm re tê gotin "Dostê Xwedê". Ji Mûsa re tê gotin "Berdevkê Xwedê". Ji hine din re tê gotin "Ruhê Xwedê" û "Delalê Xwedê".

Mirov ji kîjanî bêhtir hez dike, ji delalê xwe an ji ruhê xwe? Niha bi wijdan be ûbihêle, ku dilê te bi xwe bersivê bide. Erê, ji Îsa re tê gotin "Ruhê Xwedê". Em di Încîlê de dixwînin, ku Xwedê li ser Îsa gotiye: "Ev e kurê minî delal, bi ya wî bikin!" (Încîl: Kitêba Lûqa 9:35). Dîsa ez dixwazim ji te bipirsim: Mirov bêhtir hez ji kê dike, dostê xwe an kurê xwe? Rast e, kurê xwe. Xwedê divê çi bêje? Em dibêjin, ku kur wek bavê xwe ye. Gava ku em Îsa dibînin, em di derheqê Xwedê de bêhtir fêm

dikin (Încîl: Kitêba Yûhenna 14:9). Kur dikare cihê bavê xwe bigire û wekîltiya wî bike. Ew dikare li cihê bavê xwe bipeyive. Îsa jî wilo kir, çaxê ku ew li ser rûyê erdê bû.

Ji ber vê yekê ji wî re tê gotin "Peyva Xwedê". Xwedê bi wî re xeber dida (Încîl: Nameya ji Îbraniyan re 1:3). Ew yek e, ew bê emsal û bê hember e.

## Tu di derheqê qudretra wî de çî bawer dikî?

Ew dikare hertiştî bike. Hemû qudret û hukum-dariya wî heye. Çaxê ku Îsa li ser rûyê erdê bû tu îşen Xwedê neman, ku wî nekirin. Ji Xwedê pê ve kî dikare miriyan rake? Îsa mirî rakirin. Ji xeynî Xwedê kî dikare guriyan bi yek carê qenc bike? Îsa yên gurî paqij kirin û qenc kirin. Ji Xwedê pê ve kî dikare çavên koran veke? Îsa ev tiştên ha hemû kirin. Wî her cûrên nexweşîyan qenc kirin. Tu kes qencnebûyi ji ba wî venegeriya. Wî cin û rihên nepak bi xebera xwe derdixistin. Wî jiyana mirovan diguhert û ji gunehan xilas dikirin.

Mirovekî ku navê wî Lazer bû mir. Cenazê wî veşartin û xeber ji Îsa re şandin. Gava Îsa çû ba qebrê û got: "Lazer, were derve!" (Încîl: Kitêba Yûhenna 11:43), ew ji qebra xwe derket derve. Îsa li ser qudretra xwe ya ku dikarîbû miriyan rake, qet

şik ji me re nehiştiye. Wî got: "Qiyamet (vejin) û jiyan ez im" (Încîl: Kitêba Yûhenna 11:25).

Roj wê bê ku hemû yên di tîrbêن xwe de ne wê dengê wî bibhîzin û wê derkevin derve. Tu jî, tê ji tirba xwe derkevî, gava tu mirî bî. Mûsa jî, Birahîm jî û hemû pêxemberên din jî. Lê belê Îsa Mesîh niha dikare jiyana nû bide te, jiyan û heyata Xwedê, jiyana herheyî. Ew îro li hemû derêن Dinyayê jiyana mirovan nû dike. Ew dikare heyata te biguhere. Tu çi li ser qudra ta wî ya mezin çi dibêjî? Ew yek e û kes pê re hember nabe.

## Tu di derheqê cefa wî de çi bawer dikî?

Tu çi dibêjî li ser mirina wî? Tu dizanî tê li kûderê bimirî? Mirina te wê li vê derê an jî li dewleteke din be? Ewê li ser behrê be, di rê de be an jî di textê xwe de be? Wê li kuderê be? Tê çawa bimirî? Ewê bi nexweşiyê be, bi qeza be an jî mirina adetî be? Tê çawa bimirî? Lê belê belkî tu dikarî ji min re bêjî, ku tê kengî bimirî? Tê çend salan bijî? Kîjan tarîxê tê bimirî? Û piştî mirinê çi wê bê serê te? Ez û tu, em mecbûr in bêjin, ku em van tîştan nizanin, ew di destê Xwedê de ne.

Lê belê Xudan Îsa zanîbû û ji berê ve got, ku ewê li kûderê bimire: li Orşelîmê (yanî li Qudsê). Wî ji berê ve got, mirina wî wê çawa, li kuderê û kengî be (Încîl, Kitêba Lûqa 18:31-33).

Wî ji şagirtên xwe re got, ku wê kengî bimire, yanî di roja cejinê (eydê) de çaxê herkes hingê berxek qurban didan, ji bona ku Cejina xwe ya Derbasbûnê pîroz bikin. Hingê ewê bimire, çawa ku ew bi xwe berxê Xwedê bû, yê ku ji dêla gunehêن hemû mirovan ve bibûya gorî (qurban). Wî ji wan re got, ku ewê piştî sê rojan dîsa rabe. Ev tiştên ha hemû tam wek wî gotibûn qewimîn.

Wî zanîbû. Ew ne wek hemû mirovên din e. Em nizanin, pêxember jî nizanin. Gava Xwedê bixwaze, ez û tu, emê bimirin, û bi wî miqamî û li wî cihê ku ew dibîne.

Lê belê Îsa got: "Tu kes nikare jiyana min ji min bistîne, lê ez canê xwe bi daxwaza xwe didim. Ez dikarim canê xwe bidim û dikarim dîsa bistînim jî. Min ev emir ji Bavê xwe stand" (Încil: Kitêba Yûhenna 10:18). Wî qet guneh nekiribû, ji ber vê qasê ne mecbûr bû, ku bimire. Wî ji bona me jiyana xwe da. Ew mir, ji bona ku em bêñ efûkirin. Ew ji bona min û te mir. Ew şivanê qenc e, yê ku jiyana xwe ji bona mihêñ xwe da. Tucaran kesekî din wek wî nemiriye. Ew bi tu kesî re nayê qiyas kirin. Di nav însanan de yek tenê ye.

## **Tu di derheqê serfiraziya wî ya li ser mirinê de çi bawer dikî?**

Ew mir û hate veşartin. Dijminên wî hertişt dikirin, ji bona ku ew di tîrbê de bimîne. Wan kevirekî mezin gindirandin ser deriyê tîrbê. Wan kevir asê kir û li hawîrdorê tîrbê nobedarên çekdar danîn. Bê şubhe ew miribû û mirovan hertişt dikirin, ji bona ku ew di tîrbê de bimîne. Lê belê ew dîsa ji nav miriyan rabû û xwe nîşan şagirtêñ xwe da, ji Petrûs û Meryem û piştre ji zêdeyî pêncsed nefsi re. Ew dîsa rabû çawa wî gotibû, ku ezê rabim.

Xwedê ew ji mirinê rakir. Xwedê dixwest şanî Dînyayê hemûyê bike, ku wî Îsa qebûl kiriye. Van mirovan hemûyan ew dît. Wan piştî rabûna wî pê re xwarin û vexwarin. Wî birînêñ destêñ xwe, lingêñ xwe û teniştâ xwe şanî wan dan. Mirin dijminekî pir mezin e. Lazim e tu bimirî û ez jî. Pêxember mirin û mirî man. Şikir ji Xwedê re, ku Îsa Mesîh minn bindest kiriye. Ew iro dijî. Ew dikare wan hemûyan xilas bike, yên ku bi navê wî têñ ba Xwedê, ji ber ku ew dijî û ji bo wan şefaetê dike. Ma pêxemberekî din heye, ku iro dijî, piştî ku mir? Mesîh yê bi tenê ye, ku ji mirinê rabû. Ew bi tenê ye û bi tu kesî re nayê hember kirin. Tu kes wek wî, ne li erdê, ne jî li ezmên nîn e.

## **Hûn di derheqê çûyîna wî ya ezmên de çi bawer dîkin?**

We bikarbana Încîl bixwenda, hingê weyê çûyîna Îsa ya ezmanan fêm kinbana (Încîl: Karêن Şandîyan 1: 9-11 û Name ji Fîlîpiyan re 2:6-11).

Heke ez ji Cihûyan (Yahûdiyan) bipirsim, ku li ezmanan cihê pêşî kî wê bistîne, ewê bêjin "Mûsa", û ez ji Misilmanan bipirsim, ewê bêjin "Mihemmed", û ez ji Filehan bipirsim, ewê bêjin "Îsa". Lê belê Xwedê ne bi Cihûyan û ne bi Misilman û ne bi Filehan şêwiriye. Xwedê Îsa biriye ezmanan û navê li ser hemû navan re daye wî. Xwedê ev kiriye, da herkes û yên nefsmezin û pozbilind jî xwe li ber Îsa nizim bikin.

## **Hûn di derheqê hatina wî ya didiwan de çi bawer dîkin?**

Ewê dîsa bê. Wî ev gotiye (Încîl: Kitêba Yûhenna 14:1-3). Milyaketan jî ev gotiye (Încîl: Karêن Şandîyan 1:11). Hemû bawermendên wî li hêviya wî disekeinin. Misilman dizanin, ku ewê dîsa bê, da ji bona mirovan hukum bike. Ew tê, da ji bona ku bijartiyêñ xwe bi xwe re bibe ezmanan. Ew tê, ku li ser erdê hukumdariyê bike. Ew padîşahê Dinyayê ye. Divê, ew hukum bike, heta hemû dijminên wî

bikevine bin lingê wî. Hinek mirov şas in û bawer dîkin, ku ewê cil salî hukum bike. Xwedê dibêje 1.000 salî. Ez baweriyê bi tiştên ku Xwedê gotine tînim. Bi min, bereket û selameta 1.000 salî çêtir e ji ya 40 salî! Belê, ewê zû vegere. Hingê hemû kes wê bêjin, ku ew Padîşahê padîşahan e, Qiralê qiralan e û Serdarê serdaran e. Ew tê. Tê rojekê li ber wî bisekinî. Ewê hingê hakim be.

Gava ku tu wî rû bi rû bibînî, ewê ji te bipirse: "Tu di derheqê min de ci bawer dikî?", tê hingê ci bersivê bidî wî? Heke tu bêjî: "Tu yek ji pêxemberan î", ewê ji te bipirse: "Ma çima tu li pey emirê min ne meşiyayî?" û tê bêyî hukumkirin, ji bona ku te bawer dikir, ku ew bi tenê pêxemberekî wek wan yên din e, lê belê ew bi kesî re nayê emsal kîn. Ew bi tenê xilaskar e. Kî wê vegere, da hukum bike? Pêxember Müsa, Birahîm, Dawid an jî yek ji wan pêxemberen din? Na. Xudan İsa tê, û ewê hakim be. Xwedê garantiyek daye hemû mirovan, bi vê ya ku wî İsa ji nav miriyan rakir. Ew tê. Hemû çav wê wî bibînin. Ew yek e.

## Tu dibêjî ewê ci şertan deyne ber te?

Ew dibêje: "Werine ba min ... û ezê rihetiyê bidim we" (Încil: Kitêba Metta 11:28). Ew îro bang dike te (gazî te dike). Gava ku wî bang kir şagirtên xwe yên pêşî, wan dev ji malên xwe, ji dê û bavên xwe,

jî karêñ xwe û ji hemû tiştên xwe berdan û li pey wî çûn. Ew dixwaze ku tu jî wilo bikî. Wî divê, ku tu imanê bi wî bînî, ku ew xilaskarê te ye û tu wî bikî mezinê jiyana xwe. Ew hertiştî dixwaze. Madem ku ew dikare hertiştî li ser xwe bêje û hemû gotinêñ wî rast in, hingê şertên wî jî wê di cihê xwe de bin.

Di weldandina xwe de, di jiyana xwe ya bê leke de, di tebîetê xwe de, di qîmetê xwe yê yêkane de, di xeber û peyvên xwe yên xweş de, di qudraeta xwe ya mezin de; di cefa û mirina xwe de ew yek e û bê hember e. Ew îro sax e. Ew li ba wan e, yên ku bawenya xwe bi wî tînin. Ew li ezmanan e û ji bona wan şefaatê dike. Ewê di nêzîk de bê. Kesek wek wî ne li erdê û ne li ezmanan tune. Ji ber vê yekê ew dixwaze bibe Padîşah û Serdar di jiyana te de.



Xwendevanêñ hêja,

heke hûn bixwazin hê bêhtir li ser van tiştan hîn bibin an pirsêñ we hebin, hûn dikarin nameyê yanî mektûbê (bi Kurdî, Tirkî an bi Elmanî jî) ji me re bişînin. Navnîşana me ev e:

**Mizgînî**  
Postfach 1125  
35441 Biebertal  
Elmanya/Germany